

HEVPEYVÎN BI HUNERMEND ARAM DÎKRAN RE

Hevpeyvîn: Kakşar Oremar

_ Mamosta Aram wek hozanek Ermenî ku te li ser muzîka Kurdî xizmetek mezin ji gelê Kurdî re kiriye, em sipas dikin ku we wextê xwe da me ji bo vê gotê bêtê. Di despêkê de em dixwazin hûn li ser biyografiya jiyana xwe ji bo xwîndevanên hinekî biaxivin.

A. Dîkran: Sipas ji bo we jî, ez sala 1934'an li Qamîşloke (Rojavayê Kurdistanê) ji diya xwe bûme. Li wir heya hejde(18) saliya xwe çûm xwîndingehê. Me di xwîndingehê Ermeniyana de bi her du zimanên Erebi û Ermenî ders dixwînd. Ez dikarim bêjim hê di çaxê biçûkahiye da dengê min xweş bû, mamostayên me ku li ser dengê me jî radiwestan, dîtin ku dengê min xweş û ez teşwîq kirim. Bi vî rengî huner di dilê min da hat çandin û berfireh bû. Di hejde saliyê de piştî ku min sala heftan ya xwîndinê bi dawî anî bavê min ez ji xwîndingehê derxistim. Xwîndin di mekteb û dibistanên wî çaxî de bi pere bû, malbata me jî feqîr bûn û bavê min bi xembariyek mezin ez ji mafê ders xwîndinê bêpar kirim. Bi salan piştî vê bûyera tal dîsan jî bavê min ji ber vî karê xwe xem dikişandin nava dilê xwe. Lê ew jî bê guneh bû, ji ber ku rewşa aboriya gel bi giştî di wê demê da nebaş bû. Piştî rojekê bavê min ji min re got:

“ Ez dixwazim tu hunerê hîn bibî “

Min got: *“çima bavo?”*

Wî jî ji min re got: *“ Min ji ber hejariyê nekarî perê xwîndingeha te bidim ku tu dersê bixwînî, lê Xwedê dengê xweş bi nisîbê te kiriye û dibe tu bi vî dengê xwe yê xweş rojekê di nava dinyayê da deng bidî , mîna hunermendekî pêşda herî, gel ji te hez bike û nav û dengê te belavî her dera cîhanê bibe...”*

Min qet ev gotinên wî bawer nedikirin, ji be

ku ez ciwan bûm û baweriya min bi min tunebû. Ji ber wê hindê min ji xwe re got :

Eceba tiştêkî wiha yê bibe? Bavê min got: *“ Erê lawo çima nabe, her tişt bi qîr û xebata mirov çêdibe û mirov pêşda diçe, ezê herim ji tere ûdekê bikirim û te bişînim cem hostayekê, bila te hîn bike, dest bi lêxstina ûdê bike, dengê te jî xweş.”*

Wê demê bavê min helbest jî dinivîsandin. Wî di xwîndingehê bilind da ders

nexwîndibû, lê di warê çêkirina helbestên stranana de pir bi hizr û bîr bû. Wî ew helbestên xwe didan min ku ez bi dengê bilind jê re bixwînim, min ew helbest jê re dixwîndin.



_ Çima ji tere re digot ku helbestên wî an jî helbestên din bi dengê bilind bixwînî?

A. Dîkran: Ji ber ku dixwest hem kurmanciya min pêşbikev û hem jî dengê min vebe û hem jî min îmtihan bike. Min ji wan helbestan hêdî-hêdî kilam çêkirin. Êdî mirov dikarî bibêje tiştêkî bi navê huner ji mejiyê min derdiket. Min ji hejde(18) saliya xwe pêda dest bi karê hunerê kir, lê di berê de min bi ûdê stran digotin û heya 1959'an ez tim bi ûdê derdiketim pêşberiya gel. Ji salên 1960'an pêda amrazek bi navê Cunbuş derket. Cunbuş ji Istembolê hat. Gava lêdixistin dengê wê ne wek dengê ûdê xweş bû, lê bilind bû. Yanî dengê wê ji dengê ûdê bilindtir bû. Min ji Cunbuşê pir hezkir, çima? Ji ber ku em diçûn dewat û şahiyên gel, dengê ûdê bilind nebû û em neçar bûn bi ûdê re dengê xwe bilind bikin. Êca dema me dengê xwe bilind dikir, dengê me diket, mîkrofon jî wê demê

tunebûn. Lê dengê cunbuşê pir bilind bû û pêwîstî bi mîkrofonê tunebû û alîkarî dida dengê me. Dema mîkrofon derket, me di şevên Ereb û Ermeniyên de beşdarî dikir. Wê demê Kurdan pir kêr şevên şahiyên sazîkirin. Ev karê me dewam kir heya ku di sala 1966'an de ji mere ji aliyê dewleta Ermenistanê emir hat ku vegeerîn welatê bav û kalên xwe Ermenistanê. Yanî di navbera Yekitiya Sovyeta berê û dewleta Sûriyê de li ser vegeera Ermeniyên li Sûriyê peymanek hat girêdan û em vegeerîn Ermenistanê. Li wir pênase, pasport, xanî, cih û hemî pêwîstiyên jiyandê dane me. Hat ser şuxul(kar), ji min re gotin karê te çiye? Min got: wellah ez hunermendim. Gotin: " *başe em herin radyoya Êrîvanê* ". Em çûn radyoyê, min cema'eta Kurdan li wir dît ku di radyoya Êrîvanê da dişuxulin. Kurdan li wir jî bi qedrek mezin ez li ba xwe pejirandim, em li bîroya wan rûniştin. Ji min re gotin: " *ka çend kilaman ji mere bêje birê Aram, ka tuyê ji mere çi bibêjî?* " Ez rabê min bi Kurdî, Erebî û Ermenî hem kilam gotin û hem jî cunbuş lêxist. Bi rêxweşî ji min re gotin: " *Ha... wellah tu pir zengînî, tu yê li cem me bişuxulî.* " Min ji wan re got: Başe dîploma min tune.... Wan jî gotin ji mere dîplom nelazime". Dîploma min ya muzîkê tunebû û min li ser notayê tiştê nedizanî. Wek min got ji ber hejariyê min nekarî ders xwîndinê dewam bikim û heya niha jî ez çî tiştê lêdixim bê nota ye. Ji ber ku min bi renekî akademîk darsa muzîkê nexwîndiyê. Bi her awayî min di beşa Kurdî de dest bi karê xwe kir. Rojê çar demjimêran (se'etan) em dixebitîn.



Bi vî rengî ji sala 67'an heya 1985'an ez li radyoya Êrîvanê beşa Kurdî xebtîm. Min di despêkê de bi kilamên Kurdî destpêkir û dengê min di nava gelê Kurdî û Ermenî de li hemû dinyayê belav bû û gel em nas kirin. Berê jî ez nas dikirim lê tenê li Sûriyê. Birastî radyoya Kurdî li Êrîvanê di belavkirina nav û dengê me de pir hevkarîya me kir û navê min li wir li her dera cîhanê belav bû. Di nava wan hejde(18) salan de min çar kasê teji kirin ku niha di arşîva radyoya Êrîvanê para Kurdî de

dimînin. Di sala 1985'an de min dev ji şuxulê xwe berda û pênc salan ez bêkar mam. Li sala 1990'an li ser vexwîndinekê (de'iwet name) ji aliyê Kurdên Ewrûpa (welatê Hollenda) ji min re hat û ez hatim vir bi mêvanî. Min beşdariya şevên Kurdan kir. Li vir jî navê min li her derê belav bû. Berî ku ez vegeerim Ermenistanê li Ewrûpa min du kasê teji kirin.

_ Mamosta dema tu li Sûriyê bûy, te yekem strana xwe bi kîjan zimanî stîrî û te dest bi karê xwe stranbêjiyê kir ?

A. Dîkran: Di şahiyên de ji ber zordestiya dewleta serdest li wê demê diviyabû(pêwîst bû) ne tenê min belkî her kesî bi zimanê Erebî bistira, lê piştî wê mirov dikarî bi zimanê Kurdî, Ermenî û zimanên din jî bistira. Dewletê wisa hikim dikir û hertim ji mere digotin: " *pêşî bi Erebî bêje, piştî bi kîjan zimanî dixwînî, bixwîne...* ". Eger di berê de mirov bi zimanê wan nestirîba ji hunermend re zehmetî derdixistin.

_ Mamosta esla malbata we ji kûderêye?

A. Dîkran: Bavê min ji Sasonê (gundê Be'emde) û diya min jî ji gundê Pasorê ye. Pasor dikeve nêzîk Licê li bakurê Kurdistanê. Li Sasonê û ez dikarim bêjim li gelek herêmên Kurdistanê Kurdî û Ermenî ji kevin de cîranê hev bûne. Wek bira bi hev re jiyandê kirine, heya ku di salên 1914'an û pêde Jontirkên xwînmêj li ser serê gelê Ermenî fermana kuştinê û dûrxistinê rakirin. Kurd û Ermenî tim mîna bira bi hev re jiyandê kirine, hev

ne'êşandine, bi aştî û biratî bi hev re derbas kirine, bi xweşî di şahî û nexweşîyan de bi hev re derbas kirine. Dewat, şînî, dab û nerîfî (orif ê e' det), kultura rabûn û rûniştina wan, xwarin û vexwarina her du gelan wek heve û herdu mîna endamên malbatekê ne. Dijmin bi vî tişê wan nerihet bû, ew ji hev qetandin û kirin dijminê hev. Lê di çaxê qirkirina Ermenîyan da dîsa jî gelê Kurd pir hevkarîya Ermenîyan kirin. Dîroknivîsên Ermenî ev başîya Kurdan di dîroka Ermenîstanê de anîne ziman...

_ Mamosta koçkirina malbata we bo Sûriyê piştî qirkirina Ermenîyan çêbê?...

A. Dîkran: Malbata me piştî çend salan (heya sala 1928) an ku ji qirkirina derbas bûye di bin çavdêriya malbatên Kurdan de hatine parastin. Bi taybet malên axalêrên baş gelek hevkarîya me kirin. Gava em dibêjin

axalêr, divê ji bîr nekin ku axalêrên baş jî hebêne û axalêrên nebaş jî hebêne. Hinek ji wan ji bo doza gelê xwe her tiştê xwe fîda kirine û hinek jî bûne xulamên neyran. Şansê bav û dayika min pir baş bû, ji ber ku di mala axayekê baş de hatin sexbêr kirin.



Kurdan ew xwedî kirin heya ku rîya revandina wan ber bi Sûriyê dîtin bo aliyê binê xetê û li Qamişloke çîhwar bûn. Bavê min ji gundê (Be'emde) ye, axayê gundê wan (ku mixabin navê wî niha nayê bîra min) ji wan re xwedî derkt û nehişt bi destê Jontirkan an jî Tirkên şovenîst bîn kûştin. Be'emde gundekî derdora Semsorê ye. Bavê min li Qamişloke dest bi karê karkerîya sazîkirina xanî û beran (binna) kir. Herrî çêkirin, suwaxkarî (hûnandina dîwarên xaniyan), kelpîç danîn û hwd karên wî bû. Wê demê li Sûriyê jî rewşa aborî nebaş bû. Heya çar-pênc salan ev rewş dewam kir. Piştî wê bavê min li ba yekî xwedî fabrîke xebitî ku di wir de bavê min dema birinc û genim dianîn fabrîkê ew bêjîng dikirin û ji hev cuda dikirin. Bi vî rengî bavê min em du xuşk û çar bira xwedî kirine.

_ Bira û xwîşkên te jî bi karê hunerê ve mijêlin?

A. Dîkran: Em sê bira karê hunerî dikin, yek jî ji xwe re kar dike, her du birayên min yek kemanê û yê din jî derbokê lêdixê û carna bi min re derdiketin ser dîkê, hem bi min re stran dibogotin, hem amrazên muzîkê lêdixistin. Lê birayê min yê herî biçûk niha li Qamişloke ye û ji despêkê de heya niha bi karê xwe ve mijûle. Ez birayê mezinê malê me.

_ Başê... memosta ji evqas muzîkên cur bi cur di Rojhilata Navîn de te çawa muzîka Kurdî ji xwe re hilbijart û te bi muzîka Kurdî destpêkir, an jî wek dibêjin: çima muzîka Kurdî ?

A. Dîkran: Ew riha Kurdîtiyê di malê de hebû. Hûn yê bipirsin tu çawa hînî zimanê Kurdî bûy? çawa tu dikarî bi Kurdiyê wiha baş û pak biaxvî? Tu çawa kilaman li hev tîni? û ... sebebên xulqandina vê rihê, bav û diya min bûn, çima? Hûn baş dizanin em bi neteweyê Ermenî ne, lê gava ku bavê min û diya min bi şiklekê berdewam bi zimanê Kurdî bi hev re xeber didan, em zarokên malê jî neçar hînî zimanê Kurdî bûn. Lê em xuşk û bira dema bi hev re diaxivîn bi zimanê Ermenî diaxivîn. Bi bav û diya xwe re jî em bi zimanê Ermenî û Kurdî diaxivîn, ew jî her wiha bi mere bi zimanê Ermenî û Kurdî diaxivîn, lê dema wan bi hev re xeber dida, tim bi zimanê Kurmancî diaxivîn. Em ji wan zimanê dewlemendê Kurdî jî hîn bûn. Bi vî awayî riha stranê û bi serhev de riha evîna kultura Kurdî kete nava jiyana me. Ji wê demê bavê min ez hînî helbestên Kurdî kirim. Bi wateyekê din sebebê hindê ku

Îro ez mîna hunermendek Kurd tîm nasandin rehetî bavê min bû. Ez herdem teşwîq dikirim ku bi piranî bi Kurdî bistirim, helbest ji min re amade dikirn, di dema piroveya stîrnîna wan de li ser serê min radiwesta û kêmasiyên min didan diyar kirin. Bi taybet hertim ji min re digot: “*Bi fonîtîka zimanê Kurdî peyvên helbestên xwe bine ziman.*” Ji bona wê jî ez di demê kêma de pêşketim.

Teksta stranên: “**Diçim-Diçim, Hatim-Hatim, Bi hesreta Êrîvanê, Bisik bi têt, Tozik, çil-çil kezî, Tew tew gidî lê canê, Ax dê û bavê me, Bilbilo, Ay dil ay dil dilo lo, Dilo henono, Hey lolo delal** „, û gelek stranên din bavê min dan min û ez bi wan kilaman di nava gelê Kurd de navdar bûm..

_ Mamosta çima bavê te evqas evîndarê stiran û helbestên Kurdî bû û ji her tiştî girîngtir ji we dixwast ku hûn bi zimanê Kurdî bistirin ?

A. Dîkran: Bavê min di çaxê tevkujiyê de bi riya Kurdan ji kuştinê bi destê Jontirkan hat xelas kirin, hertim ji min re digot: “*Qedir û qîmetê gelê Kurd bizanîbe, Kurdan ji bîra neke, emekê wan li ser min pire, zehmetî û xiwêdana wan li ser min pire, ewan min xwedî kirine û eger hun çar bira û du xuşk vê gavê li rûyê dinyayê dijîn bi xêra Kurda ye ku hûn dijîn, heke dijmin min bikuştta hûn nedihatîna rûyê dinyayê, ev malîk(axa)ê Kurd ku çend salan ez xwedî kirim û ez şandim bin xetê û jiyana me xelas kir, bi xêra wan vê gavê hûn li rûyê dinyayê dijîn. Pêwîste hûn vê emeka wan qet ji bîra neken, vî zimanî biqederrîne(ji re qîmet bigre) û van helbestên ku ez didim te bike stranên xweş, bibe destek baş ji Kurdan re û wan ticaran ji bîr neke* “

_ Li Êrîvanê dema hûn çûn radyoyê bo yekemîn car tu bi kîjan kesatiyê (şexsiyet) Kurd ketî nava tîkeliyan û hevkarîya te kirin ?

A. Dîkran: Dema ez çûm wê derê serkarê radyoya Kurdî **Xelîl Moradov** bû.

Berdevikê wî jî **Ehmedê Gugê** bû. Wan ez birim cem berpirsyarê giştîyê radyoya Ermenistanê nemir **Xaçatoryan** ku ew bi xwe jî ji Ermeniyên Sasonî bû û jê re gotin: “*ev camêr ji mere lazîme*“. heza mezinê radyoyê jî ji wan re got: “*ev camêrê we (Aram) tu kaxezek, dîplomek û tiştêk wî tune*“. Gava wisa got ez li benda bersiva Xelîl û Ehmed neseknîm û min jê re got: “*Hûn izin didin ez*



pîçek li cunbuşê bêxim û kilamekê bixwînim? Wî nedizanî hunera min çiye û difikirî qey hema ez jî wisa tiştêk sade lêdixim... lê gava min bi çar-pênc zimanan lêxist û stîrîm, devê wî vekirî ma û nezanî yê çî bibêje?

Ez ji bîr nakem min bi qasî bîst deqîqeyan şeş kilam bi zimanên Kurdî, Erebi, Ermenî, Tirkî û Yewnanî gotin. Xaçatoriyan tenê got: beşe, min her tişt fam kir.

Êca li her dera dinyayê eger mirov hunera xwe nîşan nede, kes destê mirov nagire. Wî jî hema digot qey ezê ji xwe re çend stranên bibêjim û bes... Wê demê mi'aşê me pir kêma bû. Nêzîkî 150 roblên Rusî bû, lê ji mere izin didan ku piştî 4 demjimêran xebata di radyoyê de em herîna dewetan û xwediyê dewetan (Kurd û Ermeniyên) hevkarîya me dikirin. Rastî jî me îdara jiyana xwe ji perê dewetan di gundên Kurdan de ku bi piranî Kurdên Êzidî ne(ji sedî %75 Kurdên Êzidî û %25 jî Kurdên misilmanin). Heyf û mixabin di çaxê me de dîn(ol) û cûdahiya olî ew ji hev

veqetandibûn, lê niha piştî xebata Partiya Karkerên Kurdistan li wir jî dest pêkiriye, rewş pir baş bûye û herkes tenê xwe wek Kurd dihesîbîne. Bi piranî Kurdên Êzidî li Elegezê û çiyayên derdora wê rûdinên, wek gundên şamîran, Huken Peryanê, Apofyanê û bajarê Çarêçabanê, bajarê Çarilçaban û li bajarê Êrîvanê jî Kurd dijîn, lê hindikin. Mirov dikare bêje ji 200hezarî zêdetir Kurd li komara Ermenistanê dijîn ku bi piranî Kurdên Êzidî ne.

_ Yekem kilama ku te di radyoya Êrîvanê de tomakir navê wê çibû?

A. Dîkran: Yekem kilama min (şev çû) bû, teksta wê ji mamostayê nemir Cegerxwîn e, wî bi xwe ev helbest da min û min jî ew kir stran. Dema li Qamîşlokê ji bo cara yekemîn min ev kilam xwend wê rojê heya êvarê min nan nexwar, çima? Ji ber ku hind li xuşa min hat, teisîr li ser min danî, ku min birçîbûn ji bîra kir. Hunerek ji aliyê Xwedê ve di dil û mejiyê min de afirî bû. Dayika min bangî min dikir: “*Lawo were nanê xwe bixwe dîsa here dewam bike*“. Min jî jê re digot: dayê bihêle min ancax vê kilamê derxistiye, kilama min ya yekemîne, pir li xuşa min diçe, dev ji min berde. Û min bi dengê bilind dixwînd:



*Tenê hiştim ay dil îşev çima çû?
Wî ez kuştim ay dil çima çû?
Rabe pey kev ay dil tu wî werîne
Te ez birêştim ay dil, îşev çima çû?
şev çû ma tu êdî hew tê lo?
Ez ranazê kengî bê te xew tê lo?
Xanî bûye zîndan têda ranazê
Te ez têda qîrîn, nalîn tew tê lo,
Ay dil ay dil ma kes nîne mîna wî ?
Na wella
Ji boy çî dil dixwaze dîna wî
Ax dema dest min keve serê min
Bi min xweş tê helim û bîna wî „*

_ Mamosta Cegerxwîn bi bîhistina vê strana te kêfxweş bû?

A. Dîkran: Belê pir şabû,... dema min di şevan de ev helbesta wî bi stran digot dihat cem min û razîbûna xwe ji deng û awaza min diyar dikir. Em her du malbat jî di Qamîşlokê de bûn, mamosta Cegerxwîn tim dihat mala me û em jî hertim di xizmeta wî de bûn. Di navbera me de dostaniyek şêrîn hebû. Mirovên mîna wî hê jî di Kurdistanê de pir kêmin. Min helbestên wî pir ecibandine û birastî jî ew helbestvanekî gelek mezin bû, hizir û ramanên wî qet namirin, hertim helbestên xwe didan min. Dema çû rehmetê ez li Êrîvanê bûm û birastî Kurdên wir û bi taybet jî hunermendên Kurd ji xatir xastina wî gelek nerihet bûn.

_ Ji hunermendên Kurd ku di wan salan de hûn bi hev re dixebtîn dikarî navê çend kesan ji mere bibêjî ?

A. Dîkran: Ji hunermendên Kurd li wê demê kilambêj zêde bi mere tunebûn, tenê kasête wan bûn. Min li wir hem kilam digotin û hem jî di para Erebi û Kurdî de şuxul dan min. Hunermendên Kurd wek karmend ku li cem me bixebitn kêmin kes hebûn. **Karapêtê Xaço** ku Silîvani(ji bakurê Kurdistan bû), ew jî Ermenî bû, di gundê Êcimyazîne an jî gundê Nimroçara dijiya, dihat radyoyê stranên xwe tomardikirin. **Dawûdê Xelo** jî ji Bexdayê hatibû. **Reşîdê Baso** bavê hunermendê Kurdî Dilovan jî dihat radyoyê û di kilamên wî de rihek Kurdî ya bihêz heye. Evane tenê bi zimanê

Kurdî distirîn, çinkî di nava Kurdan de û bi kultura Kurdan hatibûn perwerde kirin. Ji Ermeniyên aliyê me ji sedê 75(%75) zimanê Kurdî dizanin. Herwiha ji stranbêjên jin sê kesan ez ji nêzîk ve nas dikim: **Sosika Simo** ku beriya min li wir dixebitî, dengê wê pir xweş bû, berî çend salan çû rehetê. **Aslika Qadir** ku niha ew jî li Ewrûpa ye, **Zadîna şakir** ez bêjim ew jî hat Ewropa, lê piştê vegeştî. Hunermenda heja **Cemîla Celîl** û ez 18 salan em bi hev re xebitîn, karek pir girîng girtibû ber xwe, wê herroj ji sibê heya êvar kilam dikirin nota û kilamên Kurdî topî serhev dikirin, gund bi gund digeriya û kilamên Kurdî wek koka xwe dinivîsandin. Pirogramek jî ji bo radyoyê amade dikir, di karê xwe de pir hosta û zana ye. Di muzîkê de zanistegêha bilind xwîndiye, niha li Êrîvanê ye. Malbata **Casimê Celîl** tev jî mirovên zana û mezinin. Ji malbata wan helbestvan, pirofesor, doxtor û ebûqat pir derketine û birastî gelek xizmeta gelê Kurd kirine. Ji bilî stranên min stranên hemû stranbêjên din bi destên **Cemîla Celîl** hatine not kirin û tev di arşîva radyoyê de tên ragirtin. **Keremê Seyad** û **Gulîzara Casim** jî di radyoyê de sipîker bûn. Li ba min **Keremê Seyad** sipîkerê herî mezin e. Niha li radyaya Êrîvanê berpîrsê giştî yê para Kurdî ye.

_ Başê mamosta ez dixwazim dîtina te li ser van hunermendên jêr bipîrsim:

- 1) Mihemed Arifê Cizîrî,
- 2) Karapêtê Xaço,
- 3) Hesên Cizîrî,
- 4) Miryem Xan
- 5) Se'îd Axayê Cizîrî
- 6) Eyşe şan
- 7) Mihemed şêxo

A. Dîkran: Dengê **M.Arif Cizîrî** pir xweş bû, xwedî stîlek taybet e lê bi dîtina min helbestên stranên wî lawazin (ze'îfin).

Karapêtê Xaço jî di nava cîma'eta Kurdan de pir tê hezkirin, dengbêjek pir mezine û hunera wî nemire, **Hesên Cizîrî** bi dîtina min di warê helbesta stranên xwe de ji **M.Arifê Cizîrî** zîrektire. Di stîrînê de pir hostaye. **Miryem Xan** xwedî dengê bi hest û soze, xanimek zana bûye ku di wî çaxî de hat meydna hunerê, di gotin û dengê wê de ez qet tu kêmasiyan nabînim û ez ji dengê wê tu caran têr nabim. **Se'îd Axayê Cizîrî** jî hebû ku di dengê wî de hêzek mezin heye, kilamên wî pir bi wate û naveroka wan dewlemende. Bi giştî rihê Kurdî di kilam û dengê wan de hebû, ewan binaxê strana Kurdî dariştin û qet nayên ji bîr kirin.

Eyşe şan jî birastî Kurdek pir baş bû, qet zimanê Kurdî ji bîra nekir, lê qise û gotinên kilamên wê jî zêde bihêz nebûn. Miqamên wê jî hebekê nêzîkî Tirkî bûn. **Eyşe şan** di nava Tirkan de mezin bû, lê karê wê yê herî mezin ew bû ku qet zimanê Kurdî ji bîra nekir û di zehmetiyên mezin de xwe ji kultura gelê xwe dûr nekir û di nava dijimin de bi Kurdî stîrî.

Mihemed şêxo bi serê xwe xwendengehek bû. Pir ezab kişandin, zû ji nava me çû, helbest, miqam, stîl û tembora wî pir li xuşa min dihat. **Mihemed şêxo** mirovek nîştimanperwer bû, xwe û hunera xwe nefiro. Tim bi hejarî dijî, lê evînek kûr di dilê wî de hebû. Berî deh sala ez ji Êrîvanê çûm Sûriyê, li firîngêhê **Mihemed şêxo** hat pêşwaziya min, ez ji bo dîtina birayê xwe çûbûm wir, ew beriya birayê min hatibû pêşwaziya min, ji min re got: "De kerem ke em herin malê". Min jê re got: "keko niha çend sale min birayê xwe nedîtiye, ew ji mêjdaye li benda mine, em xwînekin, yê ji min bixeyide, li ser izna te ez îşev herim mala birayê xwe... **Mihemed şêxo** bi nêrînek birayane li min nihêrî û got: "Ez jî birayê teme û min ji birayê te izin standiye, were em herin û îşev xatireyên xwe carek din bi hev re zindî bikin". Wê şevê em çûn, me bi hev re stran gotin, bi girî û hêsiyê stranê strana (Ay Lê Gulê) ji min re xwînd, min jî çend kilamên xwe jê re gotin û pir keyfa wî hat. Wê şevê em bi hev re giryan, me

hêsirên bi xwîn ji bo hev rijandin, gelek behsa derd û xemên xwe ji min re kirin. Eger tu rastiye bixwazî **Mihemed şêxo** ji derd û kolên bindestiyê mir, ji derdê bindestiya Kurd û Kurdistanê dilê wî toşî nexweşiyên hat. Ez qet qencyên wî ji bîr nakem, ew feqîr û hejar bû, lê dilekî dewlemend pêre hebû. Ji bo derdên herkesê derman bû. Hunermendên mîna **M. şêxo** di dinyayê de kêmin.

_ Tu û ew hunermendên ku navê wan hat gotin heryek ji we xwediyê stîlek taybetin, stîla we giştan li ser miqam û hunera resena Kurdî hatye çêkirin, lê niha helbest û strana nû derketiye, hûn muzîka nû çawa dibînin?

A. Dîkran: Hunermendên nû gelek hene, rêyek nû, bi şan û şeref girtine ber xwe. Muzîk jî dikare bibe regek xwarinê ji bo pêşketina rewşenbîriya siyasî-civkî di Kurdistanê de û di vê rê da birastî hunermend **şivan**



Perwer pir baş xebtiye, ew ji muzîkê rind fam dike û berhemên bihêz pêşkêş dike, di karê xwe de mêrik hostaye. **Xelîl Xemgîn** jî xwediyê dengê zelal e, naveroka helbestên stranên wî dewlemendin. **şehrîbana Kurdî** jî dengê Kurdî heye, hîviya pêşerojê ye û xweş distire, **Delal û Diyar** jî dengê wan xweşe...lê rexnek min ya biçêçik heye, ku dixwazim wek birayekê li ser muzîka van komên ku di vê dawiyê de derketine, xuya bikim, ew jî eve: hinek hozanên me muzîka Kurdî ber bi aliyê muzîka pop birine, dixwazin muzîka Kurdî pêşda biben, lê ev ne pêşda birine, ji bo karên wiha sinorek, zagonek pêwîste, ji rihê Kurdîyê dûr dikevin. Rexnek din jî min ji hinek kesan heye: Her kesê derdikeve ser sehnê û du stranên dibêje bi HOZAN navê wî tînin, ji bo nimêne dibêjin: " *Hozan (?) li ser sehnêye*", li ba min ev tiştê neraste. Hozanî şuxulek rihet niye, ne karê herkesê ye, gereke tu bi salan di navda bipijî, ez vaye 46 sale lêdixim û distirim lê gava yek dibêje (Hozan Aram) ez şerim dikim, raste ew ji min hez diken lê ez hêj negehiştîme Hozanîyê. Huner behr(derya)e, çiqas bikî naqede û çiqas jî têde melevan bibî dîsa bêdawiye. Hostatî ji vî karî re pêwîste...

_ Mamosta bi serhevde bi wan zimanên ku te stiran gotine bi her zimanî çend stranên te hene?

A. Dîkran: Bi Ermenî 150 stiran, Kurdî nêzîkî 230 stiran, min 30 stiran jî bi Tirkî hene lê heya niha min li tu deran an di şevan de pêşkêş nekirine, bi zimanê Erebi 50 stiran, li şev û bernameyên Med TV û Medya TV de min carna bi Erebi jî stiran gotine, bi zimanê Yewnanî 7 stiran û bi Siryanî jî 8 stiranên min hene. Bi giştî min 15 kasê tomarkirine ku piranya wan (12 kaset) li Ewropa hatine amadekirin. Tev bi zimanê Kurdî ne û çend stiran jî bi zimanê Ermenî û Yewnanî hatine tomarkirin. Lê kasê bi nav xwe Kurdî ne û bi navê Kurdî hatine weşandin.

_ Di pêşerojê de dixwazî bi zaravên din yên Kurdî bi taybet Soranî jî bistirî ?

A. Dîkran: Ez ji zimanê Kurdî pir hez dikim, zaravên cur bi cur zimanê Kurdî mîna gulistanek rengîn neqîşandine. Di Rojhilata Navîn Kurdî zimanekî dewlemende. Mixabin bindestiya xaka Kurdistanê gelek ziyar daye me, lê bo nimune zimanê Tirkî ticaran nikare bigehe dewlemendiya zimanê Kurdî. Kurd netewek kevnar û dîrokiye. Folklorek zengîn di nava çanda Kurdan da heye. Ez ji mêj de ye dixwazim bi Soranî û

Dimilî jî bistirim, lê mixabin ne kesî hevkarîya min kir û ne jî nivîs di destê min de hebûn, lê min di kasêta xwe ya berê de (bi navê Zîlan) stranek Soranî jî gotiye.

_ Mamosta tu bi xwe Ermeniyî, lê dema bi Kurdî distirî mirov dibêje qey zimanê te yê zikmakî kurmançî ye, gelo bi dîtina te sebeb çiyê?

A. Dîkran: Rihê Kurdîtiyê û hez kirina zimanê Kurdî diya min û bavê min xistin nava dilê min û wan berdewam bi kurmançî xeber didan, bi mere jî bi piranî hertim bi zimanê Kurdî diaxvîn. Di hemer çaxê de em û Kurd bi hev re bûn, cîranên me tev Kurd bûn, rabûn û rûniştina me, erif û e' detên me, şînî û şahiyên me tev mîna hev û bi hev re derbas bûne. Ev jî tiştê eşkeraye ku emê ji wan rihê Kurdîtiyê bistînin û hînî her tiştê wan bibin. Evîna Kurdayetî û Kurdistanê ketiye nava dil û mejiyê min. Ji bona wê jî dema ez distirim bi temamî mîna zimanê zikmakî yê xwe distirim. Zimanê Kurdî li min xweş tê.

_ Ev 46 sale tu distrî û muzîkê jî lêdixî, başe ev temenek dirêje, di vî temenê bi nîrx de te ji hunerê çî fam kir? Hunerê çî da te? û bi giştî mîna hunermendekî mezin bi dîtina te hunerê te çî wateyê ?

A. Dîkran: Gava gel min dibîne dipirse: Apê Aram emrê te çiqase? Ez dibêjim: 68 salîme. Bawer naken, li vir tiştê tê îspat kirin: Xurt mayîna min tev ji teisîr û hukmê hunerê te. **Gava em dibêjin huner, du wate ji hunerê tên ber çav: Yek hunerê jê dertê me' irifet û ya du-duyan hunera sazbandiyê û kilambêjiyê.**

Di nava van çend salan de hunerê rihê daye min, nehişt ku zû êxtyar bibim. Min ji hunerê pir tişt fam kirin, dengê min li her dera dinyayê belav bû, xelkê ez nas kirim, min xwe di nava gel de dît, evîna rastî ji bona mirovanetiyê ez ji wan hîn bûm, navê min bilind bû, li her derê qedir û qîmetek mezin ji bona min hat girtin. Ez berê tenê Aram bûm, lê piştî ez bi hunerê ve mijûl bûm ji min re Memosta Aram û Apê Aram hat gotin, ev ji bo min şerefek mezine. Bi riya hunerê gel qîmet da min û jiyana min di riyek bi şan û şeref de derbas bû, ji boy min jî ev tenê bese. Lê ez qet ranawestim, ezê tim di vî riyê da bixebitim. Ez hunerê ji xwe re karek dihesibînim, karek baş. Hunerê jî çeka min ya şer kirinê li dijî dijîmine. Ji ber ku ez jî bi vî hunerê gel şadikem û berevajî wê neyar û dilê dagirkeran diêşînim.

_ 24 salan tu li Êrîvan bûy, tu çawa rastî Kurdan hatî, di şahiyên netewên ku te têde beşdarî dikir cudahiyeke dihat dîtî? Çawa şahiyên we derbas dibûn?

A. Dîkran: Di nava şahiyên Kurdan de ez bi Kurdî distirîm, eger mêvanên Ermenî hebûna me carna bi Ermenî jî distirî, dewata Kurda sê roj bû, ya Ermeniya rojek û nîv bû. Di dewatê û şevên Kurdan de me stranên folklorî û siyasî digotin, gelek xweş derbas dibû, dewletê jî hevkarîya me dikir û qet beriya me nedigirt.

_ Di wan 18 salên ku tu li radyoyê bûy çima te tenê di para Kurdî de xebat kir û tenê bi zimanê Kurdî stran gotin?

A. Dîkran: Eviya li cem min razek (sirr) e, lê ezê bo yekemîn car ji we re eşkere bikim: Gava ez bi malbata xwe re ji Sûriyê çûm Êrîvanê dema min xwest ku herim di radyoyê de bişuxulim, ji ber ku radyo li ser navê Ermeniyê e, pêwîst bû berê biçim cem wan. Berpirsyarê radyoyê ji min re gotin ka hunerê xwe nîşanî me bide? min cunbuş lêxist, ez bi çend zimanan distirîm, pir xweşa wan bi kar û hunera min hat, berpirsyarê wan yê para hunerê got: *"karê te pir başe lê em li vir bi qanûn dixebtî û divê diploma te ya muzîkê(sazbandiyê) hebe"*. Min jê re got: Ez bê diplomim. Wî jî ji min re got: *"Tu nikarî li para Ermenî bişuxulî"*. Min jê re got: Hema wisa kurtebir, got: *"Erê wellah..., bes tu dikarî herî para Kurdî jî, here li deriyê wan jî bêxe ka yê ji te re çî bibêjin"* ? Ez bi dilek şikestî çûm para Kurdî, **Xelîl Moradov** bi xêrhatinek gerim li min

kir û ji min dawa stranekê kir, min strana (şev çû) ji wan re xwend. **Semend Siybendov û Ehmedê Gogê** jî amade bûn, gava min kilam xwend bi dilgermî ez dam nava xwe. Ji min re gotin: “ *tuyê li cem me bişuxulî* ”. Min got: Ez bê dîplomim, Ermenyan ez ji bona wê nepejrandim. Kurdan ji min re gotin: “ *Ev ne şuxulê te ye, emê vê piroblemê çareser bikin* ”. Em bi hev re çûn cem mezinê radyoyê, piştî ku min bi çend zimanan stran xwendin, **Xaçatoriyan** ji min pirs kir: “ *te kîjan xwendîngeh xelas kiriye?* ” Min jê re got: ez bêdîploma me. Ew ecêbgirtî ma û ji min re got: li vir bi bê kaxez naşuxulin. Lê ji min xwest ku çend rojan derfet ji wan re bidim ku bersiv bidin min. Li wir ez qet ji bîr nakem Kurd ji min xwedî derketin, hevkarî û piştgîriya min kirin. Ji mezinê radyoyê re gotin bi bê dîploma jî ev hunermend ji me re lazime. Berpirsyarê giştîyê radyoyê ji rûyê neçariyê bi Mosko re ket nava təkeliyan û ji wan bersiv xwest, kanê derheqa xebtîna min di radyoyê de çi bikin? Ji ber ku em nû hatibûn ewan jî izin dan ku ez bişuxulim. Qedirê xerîban jî digirtin lê tukes mîna Kurdan ji min xwedî derneketin û qîmeta min nezanîn, îro ez dîsan jî li cem Kurdanim.

_ Temenê te di riya xizmet ji bo muzîka Kurdî derbas bû, pêşkevtin û kêmasiyên muzîka Kurdî di berê da heya niha çawa didî berhev?

A. Dîkran: Berê evqas îmkân tune bûn, mîkrofon, cîhaz û teknîk tunebû, em diwestiyan, muzîka kilasîk hebû, lê niha muzîka me di her warî de berfirh bûye. Tiştên kevin tî zindî kirin, îmkân pir zêde ne.

Bi dîtina min ji bo hunermendan du tişt pir pêwîstin: yek hunermend divê bikeve nava behra bê bîna hunerê, çîqas bikole yê bêtir melevan bibe.

Ya duyemîn: ji bo hunermend şexsiyet (kesayetî) pir pêwîste, eger hunermend mirovekî giran nebe, nayê hezkirin.

Hinek hunermend hene ku di muzîka Kurdî ya pop de rihê Kurdîtiyê dimirînin. Bila muzîk berfireh bibe lê jê re sinorek hebe. Muzîka kilasîk pêwîste bê parastin û bê bi hêzkirin. Ez texmîn dikim ku niha emê di warê muzîkê de pêş bikevin. Ji ber ku niha derfetên zêrîn ji me re hatine pêş. Şoreşê her tişt ji mere amade kiriye, em divê ji vê derfeta zêrîn mîfayek baş bistînin. Medya TV rihek mezin dide mirovan, hunera hunermendan pêş dixê. Gel mirov dibîne û ji mirov re rê nîşanî dide. Muzîka me pêwîste li ser binyatê folklor û kelepûrê kevnarê Kurdistanê bê bihêz kirin.

_ Bi sê zaravên Kurdî niha muzîka Kurdî tê guhdar kirin, hûn rewşa muzîka Kurdî bi sê zaravên çawa dibînin?

A. Dîkran: Di muzîka bi zarava Soranî de ez rihê muzîka Erebî û Farisî zêdetir ji Kurdîyê dibînim, ez jê hez dikim, lê tam ne Kurdîye. Bi zarava Zazakî jî ez têde rihê muzîka Ermenî dibînim. Gava li ba min bi Zazakî distirin weke ku li ba min kilamên Ermenî bibêjin. Ez niha li ser Soranî û Zazakî dixêbitim. Bi Zazakî gava stranên kilasîk dibêjin tenê rihê Kurdî tê de tê dîtîn. Folklorê wan mîna folklorê Ermeniya ye. Min di berê de behsa muzîka kurmancî jî kir.

_ Mamosta bi dîtina te huner polîtîke an ne?

A. Dîkran: Pîrsek pir xweşe. Hunermend gava kilamên evîndariyê dibêje, rewşa



civaka xwe ya sosyolojî tîne ber çavan. Kilamên şoreşgerî bi serê xwe beşek ji muzîka nûjena Kurdî ne, rewşenbîriya siyasî di nava gel de ber bi pêşde dibe, mirovan ji xewê şiyar diken, belê huner jî dikare bibe hevkarê xebatên polîtîk.

_ Li ser boçûna te strana Kurdî bi çend paran ji hev tîn veqetandin?

A. Dîkran: Ez dikarim bêjim strana Kurdî çar-pênc pare: Stranên şîniyê, stranên şahiyê, stranên folklorî, şoreşgerî û stranên Evîntiyê. Ez bi xwe bi piranî di şaxê strana evîntiyê û siyasîyê de stîrîme.

_ Çima strana evînyê û siyasîyê zêdetir bala te kişandin ser xwe?

A. Dîkran: Ez dikarim li ser evîndariyê xatîrek xwe ya biçêk ji te re bînim: Dema mirovê hunermend evîndarê tiştêkî nebe, qet nikare huner biafrîne. Ez bi xwe di dema ciwanîyê de li Qamîşlokê bûm evîndarê keçekê, min kilama (keçê ji bona te ez dînim) li ser evîna wê afirand:

*“ Keçê ji bona te ez dînim
Kilama li ser te dertînim
Çavê xwe li te digerînim
Bawer nakem te bibînim
Dibê me were çima nayê?
Tu kevoka vê dinyayê
Ser te e'wire nabê sayî
Tu ji hêlîna xwe dernayê
Keçê îro ber êvarê
Hîviya teme li bin vê darê
Dûrve gava te dibînim
Dil û hinav tîne swarê“*

Kilamên evîntiyê wihane û her hozan û hunermendekê ku bêje min hez nekiriye û ez nebûme evîndar, haşa huzura we derew dike. Ji ber ku ev kilam bi bê evîndarî nayên afirandin, heya mirov hez neke, nikare kilam derxe. Gerek ji tiştêkî hez bike, ji gulekê, ji darekê, ji qîzekê, ji xortekê, ji mirovekê û... hwd. Gava hezkirin hebe mirov dixwaze tiştêkî li ser hezkiriyê xwe bîne ziman. Ev kilam jî wisa hat afirandin.

_ Başe mamosta bextewerîya hunermend di çi da ye?

A. Dîkran: Li ba min gava hunermend di nava civatekê de dilxweşiyê pêk tîne, bi can û dil mirov ji min razîbin, bi dil û can hunerê min bipejrin, wê gavê ez hunermend bi mirovekî bextewer dibînim. Ez berî çend salan dema li Ermenistanê bûm nexweşîya (Olser) li ser min çêbû. Ez birim nexweşxanê ku operasyon(ceerahî) li ser min bê çêkirin, lê berya wê ez birim odeya min û gotin: “*tuyê heftiyekê li vira razî û bi dermanan emê nexweşîya te çareser bikin.*” Piştî du rojan min bîrya saza xwe kir, çawa bikim? çûm cem doxtor, ji min re got: “*Ma tu herî kûderê yê saza te bi tere be?, nexweşxane û sazbandî? qet hev digirin?*”. Min ji doxtor dîsa ricakir ku bihêle ez cunbuşa xwe bînim cem xwe û ji xwe re carna lêxim. Ez birim cem doxtorê mezin û daxwaza min jê re got. Doxtorê mezin ji min pirsî: “*Tu ji kûderê yî?*” min jê re got: “*Ez ji ermeniyên Sûriyê me.*” Wî jî got: “*de başe çinkî hûn mêvanên me yê ne, em xwesteka te dipejrin.*” Min cunbuşa xwe anî. Doxtor ji min re gotibû ku dema îstraheta nexweşan ku di salonê de digerin divê deng ji saza te dernekeve. Min di oda xwe de dest bi lêxistinê kir, hemî nexweş hatin cem min û bi bê dengî li saz û awazên min guhdarî kirin, nexweşan ez kişandim salonê ku li wir ji bona wan cunbuşê lêxim. Çend roj derbas bûn, doxtor hatin ku li hinek nexweşan derziyan lêxin, nexweşan

nepejrandin, gotin: “*derzî û dermanên we bi qasî dengê saza Aram li me teisîr nekiryê, me dermanê xwe dît, êdî bese...*”

Birastî jî muzîk bibû sebebê çêbûna moralek mezin di dilê nexweşan de. Niha li ser pêşnyara hinek pesîkolojîstan huner û muzîk ji bo derman kirina gelek nexweşiyên rihî û rewanî bikar tên. Muzîk wek filsofêk dibêje: “*Xwarina riha mirovaye.*” Ez bixwe jî bi xêra muzîkê hê mîna gencame.



_ Mamosta di van 68 salan de xweştirin û nexweştirin xatira te di jiyane da çiyê ?

A. Dîkran: Te pirsek xweş kir. Xatira min ya xweş ya yekem: gava ku dewleta Ermenistanê hat Sûriyê û em vejerandin welatê bav û kalên me Ermenistanê pir li xweşa min hat. Roja dîtina radyoya Êrîvanê û para Kurdî jî ji bo min xatirek xweşe. Gava ez ji şev û dewatan razî vedigerîm malê û tu kêmasî ji aliyê me de çênedibûn ji bona min

xatireyên xweş di vê barê de jî hene. Roja ku kurê min hat dinê jî eger bask û perê min hebûna ezê bifiryama esman. Dema li dijî dewleta dagirkera Tîrkiye şerê Kurdan dest pêkir, ji min ve ez ji nûve hatime dinê. Gava ez ji Ermenistanê hatim nava Kurdên Ewropa jî pir kêfa min hat. Lê ji vane tevan xweştir ew gav bû dema **Med.TV** vebû û ez çûm min di Med. TV de bi zimanê Kurdî kilam gotin. Wê şevê heya sibê ji xweşyan ez ranezam. Berê tenê dengê me dihat bîhîstin lê niha rûyê me jî dihat dîtin. Ev ji bona min xatirek xweş e. Gava gel bi çavek mezin li hunera min dinêre ,ev jî ji bona min şahiyek xweşe.

Xatireyên nexweş: ya yekem gava em li Sûriyê bûn beriya despêka bernamê eskerên Erebi dihatin li ser serê me radiwestîn û ji mere digotin divê tu berê bi zimanê Erebi bistirî. Ev ji bona min xatireyek pir nexweşe ku nayê ji bîrkirin. Dema ez hê li Ermenistanê bûm, ji aliyê hevalan re ji min re hertim de'iwetname dihat, dewletê hatina min nedipejirand. Eviya jî ji minre xatireyek nexweşe. Şehîdbûna serleşker **Egîd**, **Mirina Mihemed şêxo**, **Aram Xaçtorîyan** û **mamosta Cegerxwîn** jî ji min re xatireyên herî nexweşin.

_ Ji hunermendên Kurd ku bi zarava Soranî distirin tu ji kê hez dikî ?

A. Dîkran: Yên kevin **Hesen Zîrek**, **Seyid Elî Esxer Kurdistanî**, **Tahir Tofîq**, **Mihemed Mamlê** û ... pir hunermend bûn. Ji wan yê nû ez karên **Nasir Rezazî**, **Necmedîn Xûlamî**, **Merziye Rezazî** û **Bêhçet Yehya** baş dibînim û dikarin hê jî baştir bibin. Min bi xwe jî kilamek bi Soranî di Med TV de tomar kirye.

_ Te li ser rêber û serokên Kurd ku di rêya Kurdistanê de şehîd ketin kilam gotine an ne? Şîreta te ji bo hunermendên Kurdî çiyê?

A. Dîkran: Belê li ser Komîtan **Egîd**, **şehîda şehîdan Zilan**, **Firat**, **Mezlum Doxan** û gelek şehîdên din min stran gotine. Şehîd hebûna netewekê ne ku ew netewe bihayê azadiyê bizanîbin. Ez canfidayiya şehîdan hertim tînim ziman.

Di vê barê de jî şîreta min ji hunermendên Kurd re eve ku van nîrxên dîrokî ji bîr mekin. Her sal konferans û civînên ku tên çêkirin, pêwîste dîsa bîr çêkirin, ku hunermend li ser rewşa muzîk û hunera Kurdî rawestin. Nîrxandin li ser berhemên derketî çêbibin. Pêwîste hunera Kurdî bê berfireh kirin, muzîka kilasîka Kurdî pir

dewlemende, divê em niha wê bibirqînin û ji nûve zindî bikin. Her sal pêwîste hunermend li dorahev kom bibin. Helbestvan jî divê hevkarîya hunermendan bikin. Îro rewşa gelê Kurdî ne wek berêye, pêwîste hunermend bi deng û awazên xwe bibe sebebê şiyarbûna gel, bibin xizmetkarên doza gelê xwe.

_ Mamosta di derbarê berhemê xwe yê dawiyê de jî hinekî zanyariyan bide me.

_ A. Dîkran: Kasê û CDya min ya nû ji aliyê Mîr Muzîk ve hatiye weşandin. Navê vê albuma min „ **Evîna Feqiyê Teyran**“ e ku bi piranî ji kilamên min yê kevin ku di nava gel de pir tîn hezkirin, pêkhatiye. Sê stran jî tîde nûne.

_ Mamosta te ji Kurdan re pir xizmet kir, te xwe ji gelê me dûr nexist, di dawiyê de tu ji gelê Kurdî çî dixwazî?

A. Dîkran: Kurd netewekî bi emeke, ez hîvî dikim ku hevgirtina di navbera xwe de bihêz bikin, qedrê serok û şoreşên xwe bizanin, Kurdistanê qet ji bîra nekin û ji bo serxwebûna welatê xwe bixebtin û xiyaneî li gel û welatê xwe nekin.

Di dawiyê de xwestekê min ya şexsî jî heye: Her mirovek yê rojekê bimire, eger ez mirim bila gelê Kurdî min bibe li kêleka tirba mamosta Cegerxwîn li bajarê Qamişloke veşêrin.

Ez pir sipasiya we dikem û ez ji gelê Kurdî pir razî me.

Têbînî:

_ 1. Wêneyên ciwaniya mamoste Aram tev ji arşîva mamoste Aram Tigran hatine wergirtin.

_ 2. Aram Dîkran xwediyê gelek stranên dewlemende. Li jêr tekstên du stranên wî bala mirov dikişînin ser rastiyeke ku Aram derdê Kurdanê yê bindestiyê baş naskiriye.

_ 3. Min pêşgotina vê nivîsê bi awayekî kurt di kasê û CD ya mamosta Aram Dîkran ya dawiyê(Evîna Feqiyê Teyran) ku ji aliyê Mîr Muzîk ve hatiye weşandin, belav kiriye.

BILBILO

Hey lê, lê wayê gidî bilbilo
Wê bayê lêxist, hêlîn tev xerakiro
Perîşano, de sêwiyo, mihaciro
Tu bi hesreta hêlîna keviro

Bilbilê reben guneye na lîlîne
De xema şalol, ji xwe re xweş dixuîne
De derdê bilibil ne qefesa zêrîne
Meqsedê wî wetenê xwe bibîne

Hey lê le wayê gidî bilbilo ax û ax
Tu çima mayî wisa bê dar û şax
Tu rebenî guneyî, sêwiyî
Stara te tune tu bê ciyî

Gotin: Dîkran Melîkyan
Meqam: Aramê Dîkran

DÎLBERÊ

Li baxê min bû zivîstan
Ay Dîlberê dêm Gulistan
Ay Dîlberê dêm Gulistan
Çilmisî gul, bax û bostan
Wêran ezim malim xerab

Koro
Ay dîlberê qe menale
Feqiyê Teyran êdî kale
Nexweşekî pir bê hale

Tu him gulî, him rihanî
Tu him derdî, him dermanî
Tu him derdî, him dermanî
Him hekîmî him loqmanî
Wêran ezim malim xerab

Ay dîlberê de tu zanî
Kûlîlk vebûn çiya û banî
Bilbil pirs kir, Feqî kanî
Wêran ezim malim xerab

Suphan ji navê te re tenê
Xalek ji xala gerdenê
Xalek ji xala gerdenê
Te ez dîn kirim berdîm dinê
Wêran ezim malim xerab

Gotin: Feqiyê Teyran
Meqam: Aramê Dîkran